Dumahîk ***: H evpeyvîn...***

û weke ezmûnên gelên dinyayê û gelê me em hîn kirine, tiştek hazir û bê kêmasî tune ye. Jiyan, dibstan e, mirov fêr dike çawa bûyeran bişopîne û çawa pêşkêşiya wan bike.

4- Gelo sedemên berberî û devavêtinên ne di rê de ku car bi car di navbera rêxistinên me de serî hildidin çi ne? û çima emê ne bi biratî û hevaltî di çarçewa mafên nêrîn û derberînê û rêzgirtina baweriyên hev de li ser yek maseyê rû li rû, bi rengekî modern rexneyan li hev negirin?.

Sedemên nakokiyan di navbera hêz û partiyên kurdî de gelek in, min di pirtûka xwe de(Ronahî li ser tevgera kurdî li Sûriyê) hin ji wan sedeman dane xuyakirin, hêvî dikim li min bibûrin ku ez niha wan dubare nekim, lê, bi her hawî, ez durust nabînim ku ew newekhevî di nerên û bîrbaweriyan de rengekî dijminatiyê wergirin weke berê dihate kirin û mixabin weke îro jî hin hewil didin bikin.Dibe ku em di hin pirsên siyasî de ne yeksa bin, lê, şerm û kirête ku ev cudahiya nerînan bibe egera dijminatiyê û rêzgirtina hev winda bikin. Ji hêla xwe ve, ez bangî hemî welatparêzên dilsoz dikim ku dengê xwe bilind bikin, şerê vê helwestê bikin, ji ber ku ev dijayetî, xwesteka dijminane, tenê dijminên me, pêk tîne, û min gelek jan ji ber vî derdî kişandiye.

5- Ma gelo ev hişkbaweriya milî ya ko li nik partiya Bes û hin kesayetiyên Ereb heye, xizmeta Sûriyê dike?

Ev siyaseta netewiya teng a nijadperest ku ji bal partiya B,es û hin hêzên Erebî li Sûriyê ve tête ajotin, ne tenê xizmeta Sûriyê nake, lê ew hevgirtina netewî jî kûr birîndar dike, dibe egera şûndemayîna welatê me di hemî warên jiyanê de.Tu kes nikare bibêje ku nerîna netewiya teng rojekê ji rojan li welatekî bûye sedemê pêşketin û avakirinê, ev yeka han jî, li bejin û bala parta B,es tê û xwe lê dixwe.

6- Weke kesayetiyeke xwedî ezmûneke dirêj di xebata kurdewariyê de, hûn çawa li têkiliyên kurd û ereb û kêmnetewyên din ên Sûriyê dinerin û hûn dixwazin ew têkilî bi çi rengî bin?.

Têkiliyên di navbera tevgera Kurdî û ya Erebî di vê qonaxê de her çend ne di asta em dixwazin de ne jî, lê ew ne xirab in, em hêvîdar in ku pêşve herin da têkeve rajeya welatê me Sûriyê û rajeya gelê Kurd û Ereb. Divê bête zanîn ku, bê wan têkiliyên durust, problêm û pirsgirêkên Sûriyê tucarî çareseriyê nabînin. Ji me hemiyan tê xwestin, ango xebatker û têkoşerên kurd ku têkiliyan bi tekoşerên Ereb re geş bikin, da em hemî bi hev re welatê xwe ava û xweş bikin.

7- Di vê qonaxa nazik de ya ku gelê me tê re derbas dibe, pêwistî bi avakirina encumeneke kurdî tune ye, ku hemî partiyên kurdî û hin kesayetiyên xweser tê de cih bigrin û ew bibe jêdera biryara kurdî li Sûriyê?.

Ez dibînim çêkirina encumeneke kurdî di bin çi navî de be, tiştekî gelek pêwist, giring û hêja ye, ji ber ku ev encumen dê roleke aktîv di xebat û yekirina gelê me de bilîze û dê xwestek û vîna gelê me yê kurd li nik yên mafên wî didine mandelê bich bîne. ***D.R (4)***